Danielle Mitterrand

Dayika Kurd

Wergera Erebî Dr. Se'dî Berzencî
Wergera Kurdî: Nejad Ezîz Surmê
Tîpguhestin: Mîrhac Mistefa

Çapa Duyem – Kurdistan 2011

Dayika Kurd

Danielle Mitterrand

Dayika Kurd

Nivîs: Danielle Mitterrand

Wergera Erebî Dr. Se'dî Berzencî

Wergera Kurdî: Nejad Ezîz Surmê

Tîpguhestin: Mîrhac Mistefa

Çapa Yekem: Kurdistan - 1996 Çapxaneya Xebat

Çapa Duyem - 2011 Çapxaneya Xanî Dihok

Ev namilke beşeke ji kitêba (Danielle Mitterrand - Gelek bi eşkereyî) ku li sala 1996 bi Fransî ji aliyê weşanxaneya Ramsy ve li Parîsê hatiye çapkirin.

Pêşgotina Wergerê Erebî

Danielle Mitterrand - Gelek bi eşkereyî

Eve navnîşana kitêbêye ku li destpêka sala (1996) an de derketiye.

Kitêb gelek rastgoyane ji kurahiya dil pirsoziyê derdibrê.

Derdê dilekî gelek bi hestiyar xistiye rû...

Birastî pire li bezeyî, soz, dilovanî û wêrekiyê...

Li berengarbûna sîtem û tarîtî û nezanî û encama asîmîlasyon û wêran kirin û li navbirina li sînor (aç'f alayman) û bi tenê mehkûm kirina wîjdanî da ranawestê û

dilê bi tenê bi hawara nerezayî derbirîna li derxistina ret kirinê û şoreşa pîşxwariya li nav ve av naxwê û guzarişt tenê li hestekî nasik û wîcdanekî zîndî neke ku her li xwera diçê rêza adalet û ronahî û azadî û demokratiyet û jiyan û binyatnan û avadankirinê ve. Belku li dergeha vekirina berbiçav dida û vedikir û diçê nav û ji bo berceste kirina armanca mirovayetiyê bilind, ku xwe ji bo terxan kiriye. Cihê pêşengayetî digrê heta bi tîn û tavekî behremenda serincrakêş ve bigihê.

Bi vî awayî perde li ser tiştan radikir û dewrujênê û han dida û hêz komdike û heft û heşet dike û rûbirû dibê û wan bê deng dike. Eve jî hemû heta bi soz û destê dayik rondika zarokê hetîukewtû û hêvî veqetiyan jê bibe û şîr û xorakê ji bo wan dabîn bike û baxçe û xwendingehan ji bo wan dirust bike û jana cîger şewatê û qurbaniyan kêm bike.

Piştî zor lêkirî û bêbeş û veqetînê.

Birastî ev jine li wêneya mirov da ferîşteyeke dilovane...

Xanim Mitterand kitêba xwe bi vî awayî dinasênê û dibêje:

`Ev kitêb rengdaneweyeke daxwaza mina bi hemû dilniyayiyek ve ye, gelek serbestiyê ve dinivîsim û dibêjim, lê belê bi wîcdanekî tevahî û asûde, bêyî wê yekê li jiyana taybetiya xwe de hurdibim yan hingî li bazina îş û karên xwe hukim li ser zilaman deynim.

Bîr û rayên min fireh alîne û poşmanbûna wê tûne û sewda têda nayê kirin, lê belê bêguman ji dil ve hilqulîne û hingî wê yekê ye ku hez ji min dikin, ji bo wan kesane jî ku rikê wan li min tê`...

Li du mijarên bergê kitêbê da ku 352 rûpele, gelek babetan têda aniye holê,

Beşa yekem terxankiriye ji bo dema(1939-1945) cengê duyema cîhanî, bi wan hemû karesatên dinyayê li xwe girtiye, bi taybetî jî Fransa ku derdê dagîrkirinê tam kir û çuye nav berengarbûna wan qehremanan... Her du malbatên Danielle û Fransuwa Mitterand jî qurbanê raste rasta dagîrkirin û qehremanê berengarbûnê bûn.

Bi vî awayî Danielle li ordugahekî bendkirin wî kesî dinasê ku piştî demeke kurt dibê hevjîn û rêhevalê temen û xebata wê.

Li beşa duyem da nivîskar behsa salên (1945-1981) dike. Li vê demê de jî girînge li jiyana xwe û malbata xwe ku li germiya ahengêrên serkeftinê li ser faşiyayetiyê de zewacê bi Fransuwa Mitterand dike. Her li wê demê de jî hevjîna wî dibe Wezîrê Herêmên aliyê dinê deryayê.

Ew sal, salên dabeşbûna civaka navdewletî bû ji bo du ordugahan, salên zalbûna şerê sar li ser pêwendiyên di navbera wan, her wiha zalbûna gengeşeya rastgir û çepgir li ser pêwendiyê siyasiyên navxweya Fransa ku li nav cergê wê gengeşeyê da bû, dibê Sekreterê Partiya Sosyalîsta Fransî û sala 1981 weku Serok Komar hate hilbijartin, li dema Serokayetiya yekem da.

Beşa sêyema kitêba xwe de behsa salên 1981-1986 dike. Li vê beşê da behsa dab û nerîta Koşka Komarî Elizie û sefera wê ya Kolombiya û damezrandina rêxistina Fransa - Azad Frans Liberte dike.

Beşa çarem jî taybete bi demên (1986-1994) ku dema zêrîna çalakiya rêxistina wê ye. Li vir de behsa hewla rêxistinê dike li xizmet kirina Kurd û runiştvanên Tîbet û hevdîtina li gel hevjîna Serokê Emerîka - Bush û Fidel Castro bi mebesta nerm kirina siyaseta warê mafê mirov da. Her wiha hevdîtina li gel Serok Komarê Brazîl Tana Karonîv li bajarê Laç û dakokî kirina li cotyarê hejarên Brazîl ku bi destê kirêgirtiyên mezin milkedarên zevî Fazenderos ketine ber êrîşa jenosaydê.

Paşê behsa dîtina Qeşe Medxeşqer dike. Bi armanca yekxistina hewlên ji bo dakokî kirina li cotyarê hejarên wî welatî. Her wiha behsa dostayetiya xwe li gel Alan Garîsa yê Serokê Pero û Pelariya hevjîna wî dike. Bendek jî ji vê beşê da ji bo vê navnîşanê kî dixwazê Danielle bê deng bike? Terxan kiriye û dipirsê: Gelo bê deng bim yan bi hemû hestekî ve bi berpirsiyarane reftarê bikim?

Her li vê beşê da Fransuwa Mitterand û janên wî jî ji bîr nekiriye. Li dawiya beşa sêyem da balê dikşîne li ser dîtina Nelson Mandela qehremanê xebata gelê Başûrê Efrîqa ya li dijî regezperestiyê dike.

Beşa dawî de (1994-1995) ê li ber girtiye ku behsa jan û azarê Serokê koçkiriyê bi dest nexweşiya kuşindeyek ve ku piştî xwe li ber girtin û bergiriyeke dûr û dirêj dest lê stand û jiyana zilamekî mezin bi dawî anî ku bi xebat û têkoşînê li ser biribû û bi şêrane beşdarî li binyatnana Fransaya nû da kir.

Min wê bendê wergêra ku benda sêyeme li beşa çarem û taybete bi Kurd.

Li wê bendê da xanim Danielle Mitterand bi dahênanekî bilind ve wê zulm û zorî û asîmîlasyon û jenosaydê derxistiye Kurd tûş buye û divê. Bi tîn û taw û azayetiya kesek, ku bi xwe bi çewsêne.

Birastî li her peyvek li peyvên wê bendê da li wan azaran da dijî li hinek rûpelên dinê kitêbê jî berceste dike...

Behsa Kurdê Iraqê dike, behsa rûdawa herî diyaran dike, korewî mîlonî nîsana 1991 her wiha behsa serkirdeyan dike û soza peng xwariya li wê bendê da sê car derdixe û dibêje...: Hest û soz li dema hevdîtina min a li gel Mesûd Barzanî gihîşte astekî bilind... Her wiha dibêje: Eve Mesûd Barzaniye serkirdeyê Kurdê Iraq, hatiye bo dîdenîm... Baweşim bo degirêtewe û li nav tîlîlî û helheleya şadiyê ku li ser zarê keçên xort da dihête derve, destê xwe dirêjî min dikeû hwd...

Li gel gelek îş û kar û bertengiya wext jî min nexwest beşdarî li gihandina peyama dayik ji bo zarokên wê nekim. Mebesta min peyama wê jina mezine bo Kurd. Ji bo wan bi Erebî dixwînin.

Spasî wan nêrînên mamosta û birayên delal Nêçîrvan Barzanî jî dikim ku daneyekî ji wê kitêbê ji Parîsê kirîbû da ku diyariyekî delal pêşkeşî min bike.

Eve bû bi hurî min hewl da benda nav bihurî ji Erebî wergêrim ku navnîşana wê Dayika Kurdane ew nasnava Kurd li wê dayika canfedaye Danielle Mitterand daye. Diyare ew nasnav jî cihê rêz û şanaziyê bûye li cem wê. Bi belgeya wê kiriye bi navnîşan. Her wiha jî bûye, ez bi xwe eve li her dû hevdîtinê de li gel, ya yekem li Hewlêr havîna 1992 û duyem jî li Parîs havîna 1995 li xwe tekîd kiriye.

Eve jî ji bîra me naçê ku nivîskarê mezin li dû bendên din jî da bi kurtî dihête ser behsa kêşeya Kurd.

Yekem: Li hevdîtinê de li gel Barbara Bûshê hevjîna Serokê Berê yê Emerîka George Bush li 20 gulana 1989.

Benda çarem li beşa çarem rûpela 242-243

Duyem: Dema behsa Fransuwa Mitterand dike.

Benda çardehem li beşa çarem 316-317

Ez jî ji bo sûda zêdetir ewê li ser Kurd hatiye nivîsîn li wan rûpelan de, min jî wergêrand û kir bi paşbend.

Xweda li pişt mebesta min be...

Wergêrê Erebî

Dayikî Kurd

Xuwênere Xoşewîstekanim!

Ba le seretay em mangî oktoberey salî 1995 pêkewe bîn. Le gelim bin le seferekem da bo şarî Bon. Firokekeman berebeyan heldestê, paşan le firokexaney Kolon - Cologne ya hawbeş le nêwan her dû şar da, denîşêtewe.

Bo geyîştin be şuwênî kobûnewey çawerwankiraw pêwîste çend kîlometrêk be naw şeqamekanî şar da ke vîllay ciwan ciwanî way lêye serî pê surdemênê.... Be dartuwî sûr perjîn kirawe, gorepanî kolêjî (Dînan-Dinan)im be bîr dênêtewe ke qutabiyekî biçûk bûm têyda. Katê yarîman le naw dirextan da dekird û xoman le piştiyan deşardewe, xoman û nihêniyekanmanî, êmey kiçanî biçkoley le amêz degirt.

Be zûtir geyîştinman, ew wextey bo man mayewe yarîdey dam be hêminî bîr bikemewe bo ewey bewperî şêneyî û dan be xo da girtin amadebim biçime naw danustan û gûftugoy çawerwankiraw, be pêçewaney ew peroşî û helçûney pêyî nasrawim, emeş bo ewey hemû tiwanay xom bo razî kirdin kobikemewe û le hewlekem da serkewtûbim, be taybetî ke pêştir hîç serkewtinêkim berew pêş be dest nehêna bû le cûlandî helwêstî deselatdariyetî eleman, ew pêşkewtine keme nebê, ke le biryarî (Rawêjkar Kol- KOHL) da salî 1994 nuwênra, ragirtinî firotinî çek be Turkiya mawey çend hefteyek, her weha mehkûm kirdinî siyasetî Hikûmetî Turkiya le layen (Kînkl)î Wezîrî Derewey Eleman le hendê boneda...

Her bo rûbînî le cenabî rawêjkarim geyand ke 23 î oktober deçim ser le Perlemanî Elmanî Bon Stag dedem.

Cenabî (Piter Lîxt Wezîrî Dewlet lay rawêjkarî Elmanî bangî kirdibûm serdanî bikem, Ew deyzanî çiyan pê delêm... To bilêyî biyewê be seyr û temaşay peroşî û be tengewe hatinî min rabuwêrê?!

Ke be xoşiyewe pêşwazî lê kirdim lêy pirsîm:

- Başe... Le gel kêşey Kurd geyîştine kuwê?

- Geyîştîne ewey êwey geyîştuwetê cenabî Wezîr.

Wergêrekem leweda bexîlî nenun da be bîrim bênêtewe, qisekanî pêşûm lay Wezîrî Derewe cenabî Kînkl û rawêjkar cenabî Kol kirdibû ke werîgêrawe û natwanê le bîrî biçêtewe.

Min hîç gumanêkim lewe da nebû, êstaş yadgarî ew dîdare germ û gurem le mêşk da çespîwe.

Be tûndutîjiyekî ziyad le pêwîst rûberuwî nermî û rûxoşî ewan westam, ew kate rexne tûnd û rastewxokanim rengdanewey riq û tureyîm bûn...

Le basêkî serincrakêşewe deçûme ser basêkî dî bo dest pêkirdinewey hêriş be şêweyekî birwa nekirde le beramber paşekişey ewan le helwêstekaniyan da..

Ke becêm hêştin le naxewe demwîst bîr û rayan derbarey ew helwêstem bizanim ke be rastî tureyî û narezayiyekî tûndî derdebirî û le dilsozî bo ew kêşeye serçawey girtibû dakokî lê dekem.

Em care hêmin debim ta ew astey beramberekem seyrî pê dê.

Bem core biyanuwekanim natwanrê ret bikirênewe...

Hendê şêwazî riwetkarî kurt kiranewe, çunke hestim dekird ême dest be gemey mişk û pişîle dekeyn.

Bo miniyan becê hêşt qise bikem, minîş utim: Way bo deçim êwe çawerwanî biryarî dadgay pêdaçûnewey Enqere, deken ke ewîş yan azadkirdinî perlemantarekanî Kurdî têda debê yaxud biryarî 15 sal zîndaniyan dedrêt...

Be zorzaniyêkewe welamî damewe: Eme birawetewe.

Utim: Lewe natirsin biryareke be pêçewanewe bê?

Welamî dayewe: Min dilniyam, çunke Hikûmetî Turkiya deskarî ew bendaney le destûrî Turkî da kirduwe ke serkutkarî zorî têdaye.

- Çon? Galte deken? yan ewe çawbestine!

Rêge be xotan meden duway xeyal bikewê, detanewê bewe razîm biken ke pêşkewtinêkî be rastî ruwe û azadî heye, be tenha deskariyek ke sizay raderbirîn le 5 salewe debête 3 sal!!

Ne 3 sal û ne 5 sal nakirête sizay dakokîkar le mafî xoy le derbirîn da qebûl bikirê.

Lêre da tiwanîm le kardanewem da dan be xo da bigirim..

Wezîr welamî dayewe:

- Belam êwe baş dezanin ême le sermane ew dewlete Turkiya le komelgey Ewrûpayî da werbigirîn, Le rêyî ewey rêgey pê bidrê biçête Yekêtî Gumrig.

Ay hey, her eme û tenya, emeş le pênawî asan kirdinî alugorî bazirganî û firoştinî çek... Rêk awaye... Belam êwe razîn wilatêk rêrewî toqandin be çekî girtibête ber bibê be hawbeştan? Aya wilatêk dehênine naw Yekêtî Ewrûpayê, çareserî aştiyaney gîr û giriftekanî nawxoy be riqêkî regezperestaney bê wêne ret dekatewe?

Lem qisanem da be aşkira tureyiyan lê be derkewt..

Min berdewam bûm:

- Êwe detanewê le gel xotan rastgo bin katê le barey kêşe le mêjînekanî ew nawçeye qisem bo deken. Ew kêşane hêşta her mawin.. Min detwanim be bîrtan bihênimewe mîratgirî resenî ew xakey le sedey yazdehemewe le layen Turk dagîrkirawe Kurdin..

- Belam ewe çi bayexêkî heye, ême êsta le ber astaney sedey bîst û yekem dayîn. Mirov le seriyetî le serdemî xoy da bijî..

Bo çî le gel wîstî ew gelane guncawtir nebîn ke daway têkgeyîştin û pêkewe jiyanî hawsêkaniyan û binyatnanî keşî aştî deken. Wek ewey êmey Ewrûpayîş duway çendîn sedey xwênawî fêrî buwîn wa bikeyn?

Boye serkirdekanman le seriyane alternatîf be hêz bisepênin. Belam zor baş debînîn çon ew hewl û koşşane her lew satey da berjewendî abûrî û darayî tûşî hereşe debêt le kar dekewin..

Aya Turkekan deyanewê bibine Ewrûpayî? Ba wabê.. Ba bibin..

Eger geranewey eskeriyekanman bo ordugakan cêbecê kird û barî naasayiyan nehêşt û helbijardinêkî rewa û şayesteyan berêwe bird..

Eweye mercî emperî hatinewe le gel pêdawîstî binemakanî demokrasiyet.

Welamî damewe:

- Êwe mafî xotane. Belam dîplomasiyetîş pêdawîstî xoy heye..

Le naxî xom da hawarim kird: Hêmin bimênewe Danielle!

Cenabî Wezîr, aya dîplomasiyetî cenabit naçare rûxandinî 3 hezar gund qebûl bikat?

Aya naçare bew hemû girtin û eşkencedan û pêşêlkariyaney hukmî rêkkewtinnamekanî nêwdewletî razî bêt?

Aya naçare qebûl bikat nûseranî here gewre, be hoy nûsînekaniyan rawbinrên?

Min bîr le Musa Anter dekemewe, şa'îrêkî berêz bû, teror kira û laşekeyşî firê diraye la rêyiyan!

Aya dekirê bêdengî le rast tawanbarkirdinî Yaşar Kemal her le ber ewey narezayî derbirîwe û le pênawî berjewendî azadî raderbirîn le wilatekey da zorî lê kirawe.. Her weha le rast girtinî hawserî gewretirîn sînemazan ke le zîndanêkî înfradî da mird. Çunke wîstî berhemî hawserekey bête nasandin...?

Min lêreda lewane ziyatir nakem be şayed ke cêgay şanazîn bo dinya, ke wa pêwîst deka nawbangiyan dij be sîtem û naheqî biyanparêzêt.

Aya dîplomasiyetî êwe ke guwêbîstî gewahî tirsnak debê û belgenamey cêgirtuwî wa dexwênêtewe, natwanrê ret bikirêtewe û raportî wa debînê wêney

sersurhênerî way têdaye bergey nagîrê... Aya dîplomasiyetî êwe naçare le beranber hemû ew kare abirûberane da cûley lêwe neyê?

Nexêr cenabî wezîr, rêgem biden bilêm min le ser heqim? Êweş çak dezanin bêdengî le beramber hemû emaneda çî degeyênê..

Êwe her le şerman natwanin lewe da hawbeş bin, ke em Turkiya ye xuwênawiye bixene pal Ewrûpayêkî aştîxwaz, bo ewey şerî nawxo û pakokirdinewey regez û hemû şitêkî tir bawête wilatekanman..?

Boye pêwîstî berberekanî kirdin hemûmanî kokirdotewe..

Min başim debînim êwe be uryayiyewe guwê le qisehênanewem degirin.

Eger wa nebûwaye her zû ew kobûneweyetan tewaw dekird..

Boye min supastan dekem ke be başî guwêtan lê girtim...

Xuwêneran! Êwe le Bon le gelim bûn û guwêtan le dadbînî min bû.. Aya le razî kirdin da serkewtû bûm?

Ewendem bese, ewey le naxim da bû betalim kird û ewey pêm bû gutim û ewendey tiwanîşim bexşîşim bû..

Duway ewey Wezîrî Elmanî lêyî pirsîm:

- Rêkxiraweket û Kurdekanit çonin? Başin?

Pirsiyarekey be çeşnêk kird diyarbû way bo çû bû welamekey be. Belê bê

Her weha utî: To le geliyan da geyîştiye kuwê?

Welamim dayewe:

- Başim.. Le dakokîkirdin le kêşekeşiyan berdewam debim.

Eger beramberekem asûde bûwaye, pirsiyarî dî nedekird.. Emin be xom asûde bûm, renge kat ya sebirî eweman nebû beşî ewe bikat hewlî çend saley dirawe bêtewe gorê.. Axir min çon detwanim le çend risteyek da kare encamdirawekan kurt bikemewe ke le deyan cîld da be hewl û koşşêkî zorîş lay berpirse siyasiyekan kokirawnetewe..

Sûdî ew nawçeyey cîhan rû le ziyadî da debê, çendî eweman le ber çaw girt ke em rojhelatî naweraste qûlayiyekî kultûriye û şaristaniyetî Ewrûpa û nawerastî têda rûberû buwetewe.

Pêwîste lewe bigeyn boçî helsukewtî çespandinî hêzêkî kemwêne lewe da desûrêtewe dijayetiyêk le nêwan siyasetî waq'iyane Realpolitik û xwast û arezuwî hezaran piyaw û jin û mindal heye lewey dan be xoyan û be mafiyan le derbirîn û

be nasnamey taybetî yan le ser xakî taybet be xoyan da binrê? Ew xakey ke beşêkî lêkdiraw le gel Turkiya da pêk dênê..

Belê ewan Kurdî minin.. Renge tekîdkirdin lewe da asan bêt, milmilanê le ser newt, keşeye le ser ew xakey le jêr pêyî ew gele daye egerî bêbeş bûniyan bê le mafekaniyan da..

Xewarekanî berayî ke be xo û be amêrî pêşkewtûtirewe bîr lê deden û derdehênin û depalêwin û deguwêznewe û le berjewendî xoyan deyfiroşin, be bêbeş kirdinî danîştûwanî xo cêyî le qazancî ew samane û peymannameyekîş duway cengî yekemî cîhanî dête gorê. Îtir sînûrêk dademezrênê, dabeşkirdinî wilatî Kurd desepênê û le gel berjewendî hawpeymane serkewtuwekanî şer da kok debêt.

Em sîsteme bo kokirdinewey qazance, wek amêrêkî kerî bê giyan be rêkupêkî kar dekat. Le yarmetî dan û pištewanî dîktatore nawxokanîş da nasengirêtewe ke gel serkut deken û deyçewsêninewe. Belam alternatîf çiye? Alternatîf berêweye..

Alternatîf cîhanêke bexşîşî xak û sirûşt be tenya bo hendêk nabê û hîçîtir belku ew dahatane be edalet dabeş dekirên.

Katêk ke pare le xizmetî mirovatî da debêt û însaniyet nagerêtewe bo ewey bibê be koley pare.. Ewe amancêke pêgeyîştinî girane belam min dilniyam lewey dête dî.

Danielle! Werewe ser zewey!!..

Min ewe debînim, eger êwe be tobawî yan be yaxîbûşim binasin. Le gel ewey ew rewanîne bo ayînde ber le êstaş rêgay xoy birîwe, lewaneye her le xoraş bûbê, belam aya le kare serekiyekanî rêkxirawe nahikumiyekan N.G.o û komele ta radeyek nasraw û karakan le yanekanî fîkir da derbarey cîhanayetî ayînde xoy nanuwênê? Eme xonîşandanêke ewe deçespênê ke çon gelêk yarmetî bo hî tir heldegirê bê ewey çawerêyî beramber ya qerebuwiyek bika.. Engîzeyşî leme da pêknanî peywendî mirovayetî ewtoye be tenha nîşaney birayetî pêweye, peywendiyêke be birwawe morkî dunyayî gelanî helgirtuwe nek dinyayî dewletan.

Dakokî kirdin le Serokî Şarewanî Diyarbekir ke eşkence diraw mawey 15 sal zîndanî kira nek le ber hoyek belku tenya le ber ewey le dayîrekey da be zimanî xoy, be Kurdî qisey kirduwe. Bû be egerî urûjandinî arezuwî min bo zanînî ziyatir le hoy pêdagirtinî Turk bo datepandinî gelî Kurd.

Hemû ew zulm û zorî û sîtemkarî û barî naasayiye le layen dinyawe be narezayî derbirîn û rîswakirdinî pêwîst berengarî nekira!!

Be guwêrey rêkxirawî Fransa - Azadî Frans Liberte bêyî ewey xom helbikêşim bewey le tiwanaman daye nexşey dinya bigorîn. Eweye heqî qise kirdin bidrê bew geley lêyî bêbeş kirawe ta bitwanêt dakokî le mafe bineretiyekanî bika. Mebestîşim lewe da dakokiye le kultûr û ziman û bûnî xoy..

Rêkewtîş niye meseley Kurd le layenî kultûriyewe werbigrîn. Katê le gel ewane da kewtîne kar ke wîstiyan salî 1983 mitmane û resenayetî bo ew şaristaniyete ciwane bigêrinewe hengawî yekemman pêş dirust bûnî rêkxirawekey xoman, pişkdarî bû le gele kariyek bo damezrandinî Enstitutî Kultûrî Kurd le Parîs (Institut Culturel Kurde Paris) rexnem lê gîra. Le ser ewey çûme ew nawçe Kurdî ye, le pêşeweş le Turkiya. Înca le Îran û duwa carîş le Iraq..

Berjewendî kêşey Kurd birdim bo ewey bîr le biyanuwênanewe bikemewe be pêy binemay dest wernedan le karubarî nawxoyî ke be piley yekem tirs û gumanî dewletan dayan nabû.

Lem rojgarey ême da, kê pena bo mafî xo têhelsuwînî însanî deba û deygeyênête ewey bête piyade kirdin? Be dilniyayiyewe deylêm wek diyare eme karêkî asan niye.

Renge bitwanrê bigutrê eme çêje...

Be bîrim dêtewe be çi tîn û tawêk pêşwazîman le derçûnî biryarî 688 î Netewe Yekgirtuwekan Encûmenî Asayîş kird.

Ew biryare be resmî serkut kirdinî danîştwanî medenî Iraqî mehkûm kird.

Cextî le ser eweş kirdewe, rêga bidrêt dem û dest rêkxirawe miroyiye nahikûmiyekan NGo bêne nawewe û le ser her dewletêkî endam le Netewe Yekgirtuwekan îşî kirde pêwîst beşdarî le hewlekanî yarmetîdan bikat.

Belam ewe çi pîtoliyetêk buwe ewey duwa birgey biryarekey pêşniyar kird ke dawa deka Iraq hawkarî bikat?

Çon dekirê bête ber çaw Hikûmetêk ew hemû hêze çekdare û bew pêdagirtinewe be kar bihênî. Danustan û hawkarî le gel rêkxirawe nahikumiyekan bikat ke hemû

koşşêkiyan bo pir kirdinewey ziyan û binyatnanewey wilatêkî wêran kiraw. Le rêyî yarmetîdanî danîştûwanî çewsaweye..

Eme karêke nêzîk le mehal.

Wazman lew erke hêna ke demanwîst be cêyî bênîn. Le gel hemû metirsiyekanî ew rêgayeş be şêweyekî dî cûlaynewe.

A lem sataney em dêraney têda denûsim. Dadgay pêdaçûnewey Turkî biryarî derbarey Perlemantarekanî Kurd da birwa be biryarî mehkum kirdin û hukim daniyan dira. Leyla Zana ta salî 2005 le zîndan da demênêtewe çunke wêra narezayî le beramber çewsandinewey danîştûwanî Kurd ke nuwênerayetiyan le Perlemanî Turkî da le Enqere dekat derbirê.

Aştîxwazanîş demiyan daxist. Çunke celladekaniyan le deselat dan...

Ême le sermane le wuryayîman kem nekeynewe bo ewey gelî Fransî agadar bêt û fişar bênê.

Dezanim her min nîm bew şêweye qise deka. Raste dengman ziyad le pêwîst lawaze... Belam min dûçarî reşbînî nabim û ta mawîşim demim danaxem.. Bo dakokî kirdinîş lêyan çendî tiwanam pê deşkê le gutin û kirdin û derxistinî rastiyekan nawestim û dengî narezayîşim berz dekemewe çendî jiyanî xelk wa bimênêtewe û le bazare sardekanî siyaset da nekate hîç.

Frans Lîbertê ew koşşe dirêje derdebirê ke deydeyîn bê hesanewe yaxud westan..

Belê bo pêşewe rêkxirawekem. Le Iraq û le Îran..

Le salî 1991 dayîn..

Hemû telefizyonekanî dinya wêney koçrewî Kurdî Iraq pexş deken.. Ray gştî cîhan kodebêtewe. Çawekan ruwiyan lew beşeye le cîhan ke le akamî şerî kendaw em karesatey têdaye.

Kurd be handanî pêşwextî rojawa le pênawî dananî sînûrêk bo dîktatoriyetî eskerî Saddam Husên û demokratiyet bo Iraq şoreşiyan berpa kird. Paşan le germey şerekaniyan da piştiyan tê kiraw bûn be qurbanî hêrîşêkî ewperî xwênawî.

Çend hêlêkî dirêj le penaberan be tulerêy çiyakan da heldegerên. Ta le rêga serekiyekan dûr kewnewe... Bûn be şemendeferêkî diwanehatû le otombêl ke le tiwanay xoyan ziyatiriyan helgirtuwe..

Hendê le otombêlekan le rêga da be hoy tewawbûnî benzîn becê hêştirawin... Hendêkiyan bê şermane ferhûd kirawin.

Tabûrî piyaderoyan dirêje û dirêj debêtewe...

Fransiyekan le beramber em dîmene dramiyane da destewestan newestan. Bizavêkî gewre û be bexşîş le pîtak tadê be hêz debê û pere desênê..

Kardaneweyekî degmen û nedîtrawî le xora bê ewey be bernameyekî dirêjxayenewe xoy bo amade kirabê. Bo helmetî pîtak kokirdinewe... Bangeşekanî rêkxirawekeman debête dûberaber..

Êwe ey ewaney nêzîkin le Kurd. Ey ewaney be dirêjayî ew hemû salanewe dakokîtan le kêşekeyan kirduwe. Êsta edî çî deken?

Le beramber ew be pîrewe hatine bo yarmetîdan nemdewîst ewe rûn bikemewe ke Frans Libertê bo yarmetîdanî aweha le hîkewe amade nekirawe..

Karî serekîman binyatnanewe û fêrkirdin û qutabxane û berew pêş birdinî hawkarî kirdinî xelkî bû duway geranewey hêminî..

Belam uşeyekman bo rûnkirdinewe negut.

Hezaran hezar çekî pare be behay çûke û gewretir û behay girîng le rêkxirawekeman dexirête ser hisabî Kurd..

Çendîn bale cil û berg û derman û diyarî dîkeman be ser da debarê.

Bem core xoman teyar kird bo nardinî karwane tirêleyek..

Bangewaziman bo biguwêz û damezrawekanî poste be tewawî guwey lê degîrê... Sexawetî danewêle firoşekanîş serbarî ew hewle berhemhênane bû..

Welamdanewey dest becêyî yekêtî nanewayan û embare gewrekan û hendê damezrawî tirim be bîr dêtewe. Ta degate tifaqnêrekanî babetî pak û temîzî û firyakewtinekanî seretayî. Ew bexşîş û dest kiraweyiye 17 tirêley pir kird ke her yekiyan 30 tonî bar heldegirt. Hemuwî be xwardin û xwardinewe û sabûn û corî dîkey diyarî bar kirabûn. Hemûşiyan xwastirabûn û şofêrekanîşiyan be xorayî hatibûn û rêgayan debirî.

Katî derçûniyan, min le (Riwasî - Roissy) bûm, ew piyawane zor dilxoş bûn bewey le pênawî kêşeyekî mirovayetî erkî xoyan debînin, be radeyek wayan lê kirdim minîş beşdarî peroşî û dil germiyan bim.

Bem core be pêwîstim zanî, katê degene ordugay penaberan ke barekaniman bo nardûn, minîş lewê bim, namewê ew katem le dest biçê.

Le kenarekanî deryaçey Urmiyê le Kurdistanî Îran, le qûlayî dolêkî uşkelanî bê ruwek û direxT.. Xêwetî heme şêwe û heme qebare heldirabûn... Binyatî le tenekew miqeba bo bergirtin le tîşkî sûtênerî roj.

Nexoş û be salaçûwan ke xêzane penaberekaniyan rizgariyan kirdûn, çend bicgurêkî be xodadan û nextê ciluberg û çend butle gazêkî seferî. Ewî heyanewniyane ewendeye le hemû pêwîstiyekî dîkeyan keme.

Rêga lewe pirtire bergey em dîmene karesatawiye bigirêt... Tirêle be duway yekewe rêzbûn û barekaniyan be çeşnêk dapoşrawe ke aw nedelênê.

Le dûrî 300 metir le xîwetga be parêzwergirtinewe westawin bo ewey le dest bo birdin û ferhûd kirdin be dûrbin...

Ême le amadekirdin da buwîn tirêlekanî pêşewe biçine naw xîwetgake ke berpirsêkî Îranî be xo û be rênuwênî pêşwextewe hat ferman derbikat. Destiyan lê nedrêt, gotî: Tirêlekan debêt bigerênewe şarekey nêzîk taku Mangî Sûr (Îranî) detwanêt dabeşiyan bikat.

Barekan hemuwî, beşî nêzîkey 55 hezar penaber dekat. Ême weku çoniyetî dabeşkirdin, demanewê be çeşnêk dabeşî bikeyn hawsengiyek le corî dabeşkirdinda hebêt.

Zor rêkxiraw pişkdariyan têda kirduwe ke diruşmekaniyan be tirêlekanewe debînrê. Frans Libertêşiyan le naw daye û minîş lewêm ta şayedî lay hemû beşdarbûyan bidem ke ewey bexşîwiyane be selametî geyîştuwe û be ser ew xelke dabeş kirawe boyan nardûn.

Paş bênew berdeyekî zor rêgayan be tirêlekan da biçine naw xêwetgake.

Her wa horiyayekî zorim dît û bîst, jin û mindal xoyan be tirêlekanewe helwasîwe û guwê be metirsî jêr kewtin naden.. Pelepeliyane.. Ferhûd kirdin le dabeşkirdinêkî guncaw da, hereşe le hemû hewlekanman deka.

Lew kateda be xoy û be bilindgoyek çûme ser tirêleyek û qisekaniyan bo wergêram: Dabeşkirdin be'edalet debêt, her xêzanêk be xoy û mindalekaniyanewe le ber xêwetekantan danîşin, bem core dekirêt beşî xotan bo bêt.

Wirde wirde hêminî gerayewe û tiwanra dest be dabeşkirdin bikirêt.. Hendê le çawdêran seriyan le dîtinî tirêleyek Koka Kola surmawe, le gel eweş da le layen pizîşkekanewe dawakirawe bo zal bûn be ser nexoşî (Dîzanterî..) yan tirêleyekî be kirê gîraw le (Qibils oread) we xawenî berhemî ciwankirdin, çi seyrêke... Belam ne ewîş sabûnî pêwîstî bo tendirustî hênawe.

Le hemû barêk da xorak û nan û rûn be çeşnêk amadekirawe maweyekî zor bimênêtewe. Hemuwîşî be pêyî pêwîstî danrawe.

Çi rojêkî mezine emro.

Paşan çûmewe Otêl Tewrêz, mandûm demewê nextêk bihesêmewe. Belam wênekan wek elbumêkî yek be duway yek le bîrim da têk deçirjên.

Rewanînî ew mindalanem be bîr dênêtewe ke be dayikiyanewe helwasrabûn, le katêk da sibeynê cewleyekî tirman le pêşew pêwîste sefer bikeyn. Emro duwayîn rojî kare giranekemane le Îran. Hêşta balyozî Fransa le Taran ziyad le pêwîst nîgerane. Minîş be guwey dekem û bo bangehêştî hawserî cenabî Rafsancanî Serok Komarî Îran deçim.

Ew minî dî ke welamî berpirsêkî Îranî Mangî Sûr dedemewe. Ewey ew beyaniye le Mehabad le sînurî Îran - Iraq têştim le gel da xward.

Dijminayetîm le beramber afretanî rojawada pêwe dît. Ew pêyî waye deyanewê waney mirovayetî dabiden. Deygot: Êmey afretanî Îran çawerêyî êwe nebuwîn ta destpêbikeyn yarmetî penaberanî Kurdî Iraq bideyn.

Barekella.. Ewe raste le gel geyîştinman da lewe dilniyabuwîn, belam lay ew afrete Îraniye ke xoy be mantoyekî reş da poşîwe. Afretî rojawa be taybetîş afretî Fransî, tenya afretêkî nazdarî rêkpoşew pêlawî pajne bilind le pê deka.. Dewrî însanî debînê bê ewey destî le ser zewî da pîs bikat.

Min ke guwey lê degirim bîr le xom dekemewe. Daxo ême le çi cêgayekî cîhan dayîn. Le her kuwê da bîn, afrete çalakekaniman yarmetî dabeş deken û beşdarî le binyatnan da deken û le gel xelkî da kar deken.

Be her hal lewê da çawim be afretanî Îran nakewê.

Ew afrete tundrow dijminkare zor turey kirdim. Belam be narezayî derbirînêkî be edeb bê dengim kird.

Le kangay xo amadekirdin bo dîdarî çend jinêkî Îranî û xanimî Rafsancanî, balyozekeman rênuwênî nîmçe çapkirawî bo amadekirdibûm.

Pêyî utim: Ewan le maleweda zor asayî û serbestin û rengî tox le ber deken ke zor nêzîke le modey rojawa, pirçîşiyan danapoşin.

- Edî êsta be çi corêk pêwîste lew xwane amadebim?

- Başe bo ewey weku xanexuwê bît, yekêk le kirasekanit bipoşe.... Minîş mantoyekî reşî ta mil dugmedar û foteyekî ser dapoşînim le berçaw girtuwe.

Be pêyî keşî pêşwazîş detwanî biryar bidey axo deşê manto û foteke dabinêyî yan na?

Geyîştîne pêş malêkî ciwan û pêşwazîm lê kira:

Kes pêyî negotim mantokem dabinêm.

Xanimî Rafsancanî afretêkî roe sûke... Le gel xoy birdimiye salonêk ke deste xuşkekanî lê kobibûnewe. Hemû afretekan wek yek cilî reşiyan poşîbû. Be germî û ruwî xoş û qisey xoşewe pêşwaziyan lê kirdim. Cêgay xoman le ser qenefey pan û por girt û şerbetî mîwe û kêkiyan daynê. Le naw hemuwiyan jinêkî cihêl serincî rakêşam. Xoy be hawserî piyawêkî (Biznisman) pê nasandîn..

Boy gêramewe ke zor deçête Parîs, deçête şano û xane gewrekanî ciluberg û ser le mozexane deda.

Wam be xeyal da dê lebanîjey qawexaneyek danîştuwe û be tewawî lew dîw rûbende şûşeyekan da le rêgay (Muburc - Sant - Uturî) ya le şeqamî (Montayn) da deybînim.

Paşan deçîne ser xwan. Hest be germî hewa dekem, belam le gel eweş da bergey fotew mantoy dugmedar degirim.

Bo rûbînî û edeb niwandin bo xanexuwêkem, Lew şuwêney ke le nêwan xanimî Rafsancanî û ew afrete cihêley ke Fransiyekî zor çak dezanê. Bom danrabû danîştim.

Axaftinî giştî dest pê deka, boçî hatûmete Îran û dewrî rêkxirawekem le yarmetîdanî Kurdî Iraq... Paşan bazney danustan firawantir debê û dakokî kirdin le mafî mirov û jiyanî xatûnî yekemî Fransayş degirêtewe..

Axaftinî bê bername, bo kat be ser birdin..

Em care bê pêşekî nakaw xanimî Rafsancanî lêyî pirsîm:

- Başe to le gel poşînî fotey? Gîr û giriftîşt le ser ewe le gel ray giştî Fransî û Hikûmetî Fransa da hebû.

Welamim dayewe:

Êwe be awejû ew helwêstey min derbarey poşînî fotew ew heft û heştey lêyî kewtewe, lêk dedenewe...

Êwe poşînî fote le layen qutabiyanî urdesal û nêwan ewey le be cêgeyandinî qedexekirdinî ke be serî da deşkêtewe têkel deken.

Min ke dijî cêbecê kirdinî qedexe kirdinî fotem, ewe nageynê le gel poşînîdam.

- Le gel eweş da eweta lêre deypoşî.

- Belê: Belam bo rûbînî û rêzniwandine.

Belam dilniyabe, her duway birînî sînûr, azadî dedemewe qijim ke be kuleweye boy.

Basî elmaniyet û rêzgirtinî xelkî tir û fêrkirdinî giştî kira ke biryarî diyarî kirdin bo qutabiyan dehêltewe.

Şîwxwardin xerîke tewaw debêt. Hendê qisey ta radeyek xoş û binyatner keşî dewrî xwanekey fênik kirdewe.

Awir le xanexuwêm dedemewe debînim fote estûrekey nextêk le ser qijî labirduwe ke way kirduwe be asanî foteyekî dîkey jêrî bibînrê, ew foteye le xaney cilubergî (Hermes)e.

Le dilî xom da pêkenînim beme hat.. Wam hate berçaw xanim ewe niye deyewê le pêş min da derkewê.

Hemû şitêk be cêyî xoy, min bîr le Qasimlo dikemewe, ew serkirdeyey rêrewêkî aştî bo Kurdî Îran hebû, salî 1989 le nêw danustanêkî aştiyane da le gel nuwênerî axay Rafsancanî namerdane terorkira.

Xanexuwêkem pêyî waye hemû şitêk le Îran da berkemale delê: Rejêmî Îran nimûneyeke le dahênan û edalet û program da çawî lê dekirê (çunke edaletî asmane) Xwa çak û xirapî lêk cuda kirdotewe, xirapekan pêwîste be nawî xwa bo wîstî başekan ser danuwênin.

Min guwêm bo radêrawe û pêkeweyş be dem nan xwardinewe bew projeyeda deçînewe ke le gel komelêk pizîşkî Îranî da amade kirawe.

Ew projeye kutanî hemû mindalanî Iraqî penaber bo Îranî têdaye.

(Ew helmete ême başî lê dezanîn û twanaman pêy deşkêt çend salêk le mewber bo danîştûwanî cîbotî taqîman kirdotewe).

Le gel geranewem bo Parîs, pêwendî be gewretirîn taqîgekanî pizîşkî û rêkxirawî (Merewx) dekem razî bûnî xoyanman bidenê... Le yek hefteda hemû şitêk amade debê, pêkut û sarincok û (17) pizîşk ke bo helmeteke pêwîstin.

Be telefon pêwendîm be hawbeşe Îraniyekeman kird û pêm rageyand, nêrdeke wextî hatiniyetî û le çend rojêkî tir degat.

Le gel emem le dem derçû welamî damewe:

Pêkut û sarincekan pesendin û pêşwazî lê dekeyn, belam bebê pizîşk...

Le gel hemû rûnkirdinewekanîşim da, le elfewe ta ê derbarey şêwazî karpêkirawî îş û kar le bernamekemanda, xanim le qisey xoy nehate xwarewe û hatiniyanî (pizîşkekan) kirdewe..

Têm geyand, bernamekeman lêk cuda nakirêtewe pêm rageyandin be bêyî pizîşkekan hîç nanêrdrê..

Namewê nîgeranî bexşîndekan pitir bikem, Ewaney nazanin yarmetiyeke bo kuwê deçê û kê werî degrê..

Meselekem qût dayewe û rexneşim le boçûnekanim girt, çunke niwandinî helsukewtî lew renge seyrêkî têda nebû..

Hîç karêk bê dilniyabûn nabê û hîç projeyekîş bê be duwadaçûn ser nagirê..

Le becê hênanî karekem da, ke be Mesûd Barzanî geyîştim soz û mîhr geyîştine ew perî..

Be otombêl Pîranşehr becêdêlîn, efserekanî polîsî Frsansîş hemîşe be tekmewen û rêgay serekîman berew sînurî Iraq - Îran girtote ber.

Parêzgarî ew Herême biryarî da le gelim bêt, be guwêrey ew wek meseleyekî protokolî, min hawserî Serok Komarî Fransam û amadebûnî be erkî xoy dezanî..

Çendî berew pêş deçuwîn, aporey rêzî penaberan ta dehat ziyatir debû, xelkî hejar ke le tiwanay xoyan ziyatiriyan le kole, mindalan zorbey wext pêxwasin û natwanin lewe ziyatir biron..

Sawa birsî û tînuwekan, bê ziman û waq urmaw, çawiyan xafil lew karesatey têyî kewtûn tewaw zeq buwetewe.

Hendê le otombêlekan be hoy ewey benzîniyan têda nemawe bê ewey mekînekaniyan hel kirdibê şor debûnewe..

Dîmenêkî urûjêner û serincrakêşe..

Çiyakanîş lem seretay behareda dil derfênin..

Sêlaw le befrawewe heldeqûlê û cogeley lawekî pêk dehênê..

Ew wêney le mêşkim da helkendrawe, wêney gelêkî bê umêde ke le tirsan heldê..

Pêkewe hatineweyekî seyre le nêw ewane da ke be hîwawe degene Îran û lew baweredan penayek debîninewe û ewaney be rêyî xoyan da duway dîtinî ew xîwetgayaney boyan amade kirawe hîwabiraw degerênewe..

Ewaney geranewe tirsiyan le wilatî xoyan pê baştire le ser danwandin bo xiraptir..

Ke otombêleke geyîşte nêzîkî lutke ray girtîn, îtir le beramber lafawî ademiyan ke rêgayan girtibû neytiwanî berew pêş biçêt.

Parêzgar Îranî le otombêl dadebezê, êmeş be piyadeyî be duwayeweyn..

Çend sed metrêkman birî parêzgar utî: Natwanîn lewe ziyatir biçîn, lêrewe îtir sînûrî Iraq dest pê deka..

Min ke sînûrêk nabînim..

Rêçkey penaberan napsêtewe le layek dadebezê û le layekey tir serdekewêtewe û Iraq becêdêlê û ruwî le Îrane..

Zoriyan maweyek radewestan awrêkiyan dedayewew bo duwacar deyanrewaniye wilatêk retiyan dekatewe.. Dû dilîşin biçine wilatêkî dî, ke bo maweyek rêgayan lê nagirê, belam pêşwazîşiyan lê naka..

Boye çaktir eweye lêyî bedûr bîn.

Pizîşkekan le jêr xêwetî wek tîmarxane rêkxiraw firyay ewane dekewn le duwa henasedan û xorakî ew sawayane deden ke hêşta mawin..

Ewane rêkxirawî nahikumîn û xo bexş kar deken û naştwanrê lewe ziyatiriyan dawa lê bikirê deyken, çunke bewperî twanayan kar deken, her ewendeşiyan le pêşkeş kirdinî derman û pêdawîstî dîkey pizîşkî le dest dê..

Be guwêrey minîş, min ewetam le naw ew xelke da westawim ke bew perî peşêwiyewe, bê amanc dên û deçin.

Parêzgar le nêzîkimewe westawe, diyar bû le lay xoyewe biryarî dabû nehêlê le sînûr bipermewe..

:- Cenabî parêzgar, lew dû diliye degem têyî kewtuwî, min êsta le jêr berpirsiyariyetî to dam... Belam rizgar debim lêtan, çunke le Iraq çawerêm deken, tikaye le welatekey xot bimênewe, eger wîstit çaweranim be, min deçim bo dîtinî ewey çawerêm deka.

Ême berdewamîn le şorbûnewe be piyadeyî be dewrî ew otombêl û trêlane da ke natwanin lewe ziyatir biron.

Bo ewey tûlerêyekî barîk bigirîn zor mînî dijekesî lêrew lewê le hemû şuwênêk da danrawnetewe, nawe nawe rêk dekewê be hoy biçûktirîn kemterxemî mînêk le jêr pêyî kesêk da deteqêtewe..

Çi qesabxaneyeke ewe!

Piyawêk serincim radekêşê, derwa bê ewey temaşay kes bika.. Kîseyekî be desteweye û qatêkî şînî tozawî û kirasêkî spî konî le ber daye.. Boyinbaxî bestuwe û pêlawêkî wek xelkî şarî le pê daye.

Piyadeye.. Dêt û deçêt.. Be xoda delê.. Eger bîduwênî wa dernakewê şitêk tê biga.. Rewanînekanî royîştûn.. Tawêk dewestê paşan degerêtewe ser urênekanî.. Bêguman şêt buwe..

Jin û mal û mindalî le dest dawe, duway ewey malekey be topbaran wêran buwe..

Sereray metirsî mîniş bê aman dêt û deçêt..

Lêman pirsî:

Êsta bo kuwê deçî, bo çî le gel rew da be rêyî asayî rê naka?

Duway ewey doş dademênê welam dedatewe:

(Hîç şitêk le gel ewanim ko nakatewe) Ewan hemû şitêkiyan le dest dawe.

Bo ew ke çi kawil û xêzanî nemawe delê:

Min lêre hemû şitêkim heye... Deygut: Kaxezekanim.. Senedî milkekanim.. Wênekanim emey degut û amajey be sindûqêk dekird le destî dabû..

Min le nêwan ew dîmene însaniye be êşane û ciwanî sirûştî dilrefên da tîzmal tîzmal bûm..

Ciyawazî gewrey nêwaniyan îflîcim deka.

Duway ewe le komeleyekî biçûk da rêga degirînewe ber, Rafayel, Dr Tissot û Jan Mîşêl û efserî pasewan komelêkî dîkeş le doleke da be guzerêkî şaxawî wek bilêy pêxwestî pêşuwî pêwe nebê ser dekewn..

Ewe Mesûd Barzanî ye, serkirdey Kurdî Iraq, hatuwe bo dîdenîm.. Baweşim bo degirêtewe û le naw tilîlî û helheley şadî ke le zarî keçanî cihêlewe dête derê, be germî tewqem le gel dekat...

Pasewanekanî şuwênêkiyan bo amade kirdîn lêy dabinîşîn, çend tolazêk (Pêşmerge) fîşekdaniyan pêweye, dadênewe lakêşeman bo le lêwarî cogeleyekî çûkey kaniyawêk, le ser giyayekî bilind û nerm radexen.

Be çwarmeşqî cêgay xoman degirîn û min guwê degirim.

Ême hemûman şayedî û êş û umêdekaniman tomar dekeyn, çawîşman le projekanî ayîndeye, ew demey aştî bo Kurd degerêtewe, ewaney eger parastiniyan bo mîsoger kira detwanin bigerênewe şuwênî xoyan..

Ême le nêw xoman da birwaman waye û basî dekeyn û hîwaxwazîn em sate dirêj bêtewe.

Bo rêzlênan û mîwandarîş êwareyekî dereng xoman le dewrî xwanêk da dîtewe, (ça) man le nêw klaşînkofe dirêjkirawekanî tenîştman pêşkeş dekirê.

Raste mîwannewazî Kurd danî pêdanrawe, belam lem barudoxeda zor nemawe bawer be çawekanim nekem û natwanim kontrolî sozim bikem..

Hawrêkanîşim her wa bûn.. Be hoy kartêkirdinî le radebeder natwanîn giriyan û firmêskman le we ziyatir qût deynewe..

Çend lawêk gulekêwî ko dekenewe û deykene deskene û pêşkêş man deken.

Wam be bîr da dê le dîmenêkî metafîzîkî ew dîwî sirûşt da dejîm.. Dîmenî gule wenewşey kêwî ke rastewxo bê gela le ser zewî da kirawnetewe yaxud be hoy kurtî laskekaniyan le giya da win bûn.. Pêyî şageşke debî..

Maweyekî zor deskêkî uşk helatûm helgirtibû ke le gel xom da hênabûme Parîs.

Destexuşkêkim ke wênegirêkî be cesarete be diwam da hat û komelêk wêney bo girtîn.. Wênekanî ew dîdareman lay xoman helgirt..

Duway ewe Barzanî bo ew şuwêney lêyî hatibû şor debêtewe minîş rêyî geranewe degirmeber..

Parêzgar le ser lutke çawerêm deka û le serîşime xwahafîzî lem gele bikem ke le ewperî peşêwî daye.

Paşan be otombêl degerêmewe otêl û yawerekem hîçim lê napirsê, minîş supasî dekem bo eme.

Ew wêne karesatawiyaney le xeyalim da degerên, be serim da desepênin şayediyan bo bidem.. Belam min lem sate da hest dekem wek bilêyî lal bim natwanim biduwêm..

Pêwîste ewey pêştir le salî 1988 da bînîwme be bîr bihênimewe katê narezayîm dijî siyasetî enfal derbirî ke le layen dîktatoriyetî Iraqî da piyade kira.

Lay Kurd hêrişekanî enfal wate rûxandinî gundekaniyan le layen serbazekanewe, ewaney ferhûdiyan kird û danîştûwanekaniyan le waney neyantiwanî helbên, bê wîjdanane qîr kird.

Supa zatî kird gazî jehrawîş bibarênête ser danîştûwan le şarêkî wek Helebçe ke paşanîş be şêweyekî rêkupêk be serikdiyan da tepand.

Şêweke be rastî bo rûxandinî ew xanûwaney binimîçekaniyan le dereweye karaye!! Bombayekî zor be hêz le nihomî zewî dadenrê ke bese bo wêrankirdinî.. Wek koşkêkî kartonî waye le hewada pif dekirê ta debêtewe çil û çêwî dawerî û be ser serî danîştûwanî nawî, ewaney nemawin, le qurbaniyekanî bordûmanî kîmyawî da.

Aha bem çeşne hikûmet le gel gelî Kurd decûlêtewe, xo kemtirîşî be Iraqiyekanî tir nekirduwe ke le beramber siyasetî da westabin, şî'e bûbin ya hî tir.

Salî 1988 deyan hezar Kurd helatin û penayan bo Turkiya û Îran bird.

Bo yekemîn car nîsanî 1989 le xêwetgayan da wek penaberî zîndanî wabûn, pêyan geyîştim em sînaryoyeş ewane pêşan deda tiwanîwiyane be hezaran bigene ew xîwetgayane, belam ewaney rêgay geyîştiniyan lê gîra, ewane le layen supay Iraqewe kujran û le nawbiran.

Hî tirîş ta sînûrî Îraniyan Sûriya helatin, ewanîş dozex çawerwaniyan dekat.

Serokayetî wefdêkim kird ke le layen rêkxirawî (Frans Libertê) we rêkxirabû bo beserkirdinewey barî jiyanî ewane, duway ewey le layen çend kesêk ke be çawî xoyan bînîbuyanin agadar kiraynewe.. Ewane hatibûn şitî wayan degut wîjdanî mirovî dehejand.

Her weha bo be dengewe çûnî bangeşey çawdêrekan ke barudoxî jiyanî kulemergiyan bekilolî nasandibû.

Duway serdanî xîwetgakan le Turkiya salî 1989 û Kore û le Îran salî 1991 rêkxirawî Frans Lîbertê detwanê le beşêkî Kurdistanî Iraq ke le 1991 ewe le layen hêze hawpeymanekanewe parêzrawe bizav binuwênê, ke le duwayîş da rêkxirawî nahikumî NGO îşî hate naw.

Bem core rêkxirawekeman geyîşte Iraq, nuwênerêkî hemîşeyî le baregakey da le Silêmanî berêwey debat û hawahengî le gel kirêkaranî Kurd heye, ke bernamey yarmetîdan û dirust kirdinî qutabxane cêbecê deken.

Le gel hendê gîr û giriftî nawxoyîş da karekan be bê kospî gewre berêwe deçin..

Hewl û koşşekaniman çil qutabxaney şeş yan heşt yan duwanzde polî lê kewtotewe..

Qutabxaney ciwanin, le berd dirust kirawin... Ême şanazî pêwe dekeyn..

Her weha şestî dîkeş destiyan tê werdawe çak kiranewe ke pêşwazî le hezaran mindal deken.

Be gişti Kurd bûnî ême le naw xoyan da be rêzêkî berzewe heldesengênin û peywendî dostayetî nêwanîşman lewêda... Dûr le sînûrman dirust debê.

Daykî Kurd wek pêyan xoşe pêm bilên..

Çendî kosp û tegere hebêt le dirust kirdinî qutabxane û binkey fêrkirdin berdewam debim bo hemûwan, bo perwerde û fêrkirdin.

Çunke ew mindalanen, sibey wêney ew siyasete dekêşin ke ber lewey piyade bikirê, pêwîste peyrew bikirêt.

Amancî serdanekem bo Silêmanî le (6) temûzî 1992 bo ewe bû hanî ew tîme nawxoyiyane bidem karekaniman cêbecê deken û le çoniyetî karekanîş dilniyabim, her weha bo dananî çend berdêkî binaxew kirdinewey yekemîn komeley bînakan!!

Ewe amancî serdanekem bû, ke otombêlêkî be TNT çênraw le ser rêgam da bo Helebce teqiyewe!!

Gelo! daxo kê bû wîstî bimkujê? kê bû wîstî bimtirsênê û sardim bikatewe?

Xwa dezanê..

Paşbend

Bêcîge lew bendey be taybetî le kitêbekey da bo Kurdî terxan kirduwe, Xatû Mitterand le dû şuwênî dîkeş da basî Kurd dekat.

<u>Yekem le lapere (242-243) û</u>

<u>Duwem le lapere (316-317).</u>

Be pêwîst zanra bikirê be paşbend, wek le pêşekî da amajey pêkirawe.

Yekem:

Ewey le lapere 242-243 da le barey Kurdewe hatuwe:

Be mêşkêk wêney trajedî têda dexûlêtewe be xatû Barbara Bush geyîştim.

Silawim lê kird... Lefîte be dewreyekîş da le rêgada bo malekeyan ême be duway otombîlî her dû Serokî Emerîka û Fransawe buwîn..

Bê pêşekî utim:

Barbara... Pêwîste basî ewanit bo bikem.. Min tenha bîr le wan dekemewe..

Paş satêk sersurman lêyî pirsîm: Mesele çiye?

Kurdî Iraq: Penaberekan le xêwetgakanî Turkiya..

Be tewawî helçûnewe, xapûr bûnî şar û dêhatekaniyan û hêrişî raguwêzan û ewaney be gaz jehrawî bûn û mirduwekan û ewaneyîş ke be acbatî rizgariyan bû minalanî birsî bê şîr û bê xorakim, bo gêrayewe.

Ew hîwa û awatem le lada hêştewe, ke ew lanewazane le êmey rojawayî dexwazin.

Pirsiyarim le çawî da xuwêndewe Barbara renge nezanî Kurd kên?

- Rastiyekey... Nexêr!!

Hestim kird serî surmawe..

: Danielle Kurd kên? Le çi parçeyekî cîhan da nîştecên?

- Heqite nezanî kên û wilatekeyan le kuweye..

Ke min, ewaney mêjuwiyan dezanin.. a emeyîşe meynetiyekeyan.

Mawey sê se'atî tewaw ke le rêga da buwîn, bom rûn kirdewe Kurd kên û mêjuwiyanim le serdemî Imparatoriyetî Osmaniyewe bo gêrayewe.

Çîrokî ew milmilanêye dirêjem bo gêrayewe ke le çendîn şerî bê dîmahî da têyî kewtûn..

Paşan lêm pirsî (Yarmetîm dedey?)

Lew birwayedam be hoy helçûnî lerade bederî min dûçarî sersurmanêk bû.. Ke welamî damewe ew ewendey min serbestî niye û utî:

Emerîkayiyekan le serqalî min be mindalanî belengaz nagen, eger lewê bê û le Emerîka da nebê..

Nazanim daxo le wey gutî le ser heqe, belam diyarbû ew qena'etî be qisey xoy bû..

Duyem:

Ewey le lapere 317-316 da le barey Kurdewe hatuwe:

Danielle Mitterand basî peywendî xoy be hawserî Fransuwa Mitterand deka û tîşk dawête ser çoniyetî helsukewtî naw xêzan û delê:

Wa debê be rêgayekî tir le gelî da bicûlêmewe.

Beyanî, wextî le mal derçûnî bo dewam, le ber derga lêm pirsî: Leyla Zana û hawserekey û Parlementarekî hizbekeyim emro bo fravîn bang kirduwe, eger wîstit û katit hebû detwanî le gel man bî.

Leyla Zana bo çareserkirdinî şuwênewarî eşkencey zîndanekanî Turk hatote Parîs.

Ew Parlemantare Kurde hêşta le astî cîhanî da nenasrawe, ewey rûnkirdewe ke duway ewey degerêtewe Turkiya gumanbar dekirê û le hesaney Perleman bê beş debêt, bêgumanîş firê dedrêtewe zîndan..

Fransuwa Mitterand welamî pêşniyarekemî nedayewe û bere bere dûr dekewtewe, minîş wek sêberî hengawekanî be duwayewem û boy dûpat dekemewe..

Lêre debê, le şeqamî bîêvê- Bewre, çunke min namewê dîplomasiyekanit narehet bikem ke be terorîstêkî sersextî Partî Kirêkaranî Kurdistan PKK î dezanin.

Eger bîbînî û guwey lê bigirî, dilniya debî dîplomasekanit be hele da çûn.. Belê... Eger tiwanît wextî firavînê serêkman le malê lê bidey, detwanî çîrokî be serhatekanî bibîstî..

Hat... Dîtî û guwey lê ragirt û qena'etîşî pê hat... Duway dû roj le nûsîngey xoy da le Elîzî ê pêşwazî lê kird..

Şerêkî labela bû, serkewtinîşî têda wedest hat..

Detwanim dakokî le kêşey Kurd bikem ke xistumete ser şanim.

Em care zanîm be tenê nabim..